

Mirina zimanekî rind



Roza Kurd
Malpera. Rizgari

Çend meh berê, konferansek li ser ziman û edebiyata kurdî li Stockholmê pêk hat. Konferans ji aliyê Komeleya Nivîskarên Kurd ya li Swêdê hatibû amadekirin. Gelek kurdên xebatkar û hêja wek birêz M. Emîn Bozarslan, Reşo Zîlan û Malmîsanij li ser ziman û edebiyata kurdî peyivîn. Di vê konferansê de pispora rojhilata navîn kurdolog Dr. Christine Allison jî gotarek bi navê "mirina zimanekî rind" pêşkêş kir. Dr. Allison ku bi eslê xwe îngîlîz e, bi kurmancî peyivî û bi taybetî li ser pêşeroja zaravayê kurmancî li bakurê Kurdistanê rawestiya. Dema dengê wê yê bi wê kurmanciya zelal û paqij hate min, dilê min geş bû. Ev ne dîmenekî rojane bû. Mirov her roj nabîne ku yekî/yeka biyanî bi kurdî dipeyive. Lê vê canîkê kar û xebata xwe dabû ser zimanê kurdî û bi taybetî li ser

zaravayê kurmancî li bakurê Kurdistanê...

Mijara gotara Dr. Allison ev bû; zimanek çawa dikare bimire? Allison ku çend mînak ji pirtûka Profesor David Crystal derxistibû, pêşkêşî me kir. Li gor D.Crystal şeş qeydên ji bo pêşdeçûna zimanekî di bin tehdîdê de;

- 1.Zimanek di bin tehdîdê de dikare pêş de biçe heger gotevanên wî bikaribin giranbihaya xwe li nav civata desthilatdar de mezintir bikin.
- 2.Heger, gotevanên wî bikaribin rewşa xwe ya aborî dewlemendtir bikin, wekî mirovên civata desthilatdar.
- 3.Heger, gotevanên wî zimanî bi awayekî meşrû bikaribin li navcivata desthilatdar.quwetên xwe xurttir bikin,
- 4.Heger, gotevanên wî di sîstema perwerdehî de hebin.

5.Heger, gotevanên wî bi zimanê xwe binivîsîn. 6.Heger, gotevanên wî bikaribin zimanê xwe, di teknolojiya elektronîkê de bixebitînin. Li gora ku lingvîst dibêjin heya 40-50 salê din dê gelek ziman ji holê rabin. Gelo ev xeter li ser zimanê me jî heye? Dr. Allison got ku ew bixwe wê xeterê ji bo zimanê kurdî nabîne, lê heger ku weha berdeyam bike, ew tirs ku zaravayê kurmançî jî bibe yek ji van zimanên wendabûyî heye.

Dr. Allison bal kişand ser rewşa zaravayê kurmançî li bakur û got; "Wek em hemî dizanin li Tirkîyê, di qanûn û piratîkê de gelek qedexê li ser kurmançî heye. Ev yek jî malbatên kurd dixê helwestên cuda. Gelek malbatên kurdan girîngîyê nadin zimanê xwe û ji berdêla kurdî bi zarokên xwe re bi tirkî dipeyivin. Ew ne bes e, perwerdeya zarokan jî bi zimanê tirkî ye. Ev jî dike ku zarok di zimanê deshilatdar de zîrektir bibin û zimanê malê feqîr dimîne.

"Dr: Allison bal kişand ser zimanê kurdî ku li nav kurdên bakur ne bilind e û bilinkirina wî jî ne karekî hêsan e

Li gora ku Dr: Allison got, rewşa kurmançî ne tîpîk e, ne wek rewşa zimanê biçûk ku li cîhanê dimirin, lê ger weha berdeyam

bike, tevî ku kurmançî zimanê bi milyonan kurdan e jî, xetereke mezin li pêşiya kurmançî heye. Gava dê û bav bi zarokên xwe re bi kurmançî nepeyivin, wê şansê jiyan û berdeyamîya kurmançî nemîne, di demeke nêzîk de wê kurmançî li bakurê Kurdistanê têk here. Ji ber ku gotevanên wî kêmbin

Belê, ev gotar ya kurdolog Christine Allison e. Lê ji bo lêxwedîderketina zimanê xwe, kurd çî dikin û divê çî bikin? Ji bo qedera zimanê me jî nebe wek ya "mirina zimanekî rind" divê em çî tedbîran bistînin? Em ji xwe bipirsîn dê em çawa bikaribin prestîja zimanê xwe bilind bikin. Va ye xelkên biyanî jî dibînin ku em qîmetê zimanê xwe nizanin û prestîja zimanê me li ba me nizime

Ez nizanim bê hevvelatîyên min li wê konferansê çî fikirîn û çî his kirin, lê ez wek jineke kurd û bi evîna welêt mezinbûyî, hem dilşa bûm ku jinek biyanî kar û xebata xwe li ser zimanê me dike, û hinekî jî êşiyam ku jinek biyanî bi kurmançiyê delal ji me re behsa mirina zimanê me dike.

Zimanê me hebûna me ye! Divê em ji vê dest pê bikin, vê bikin slogana xwe û pê de herin...